**MORFEMÊN KÊŞANÊ**

**SAMÎ BERBANG**

Morfolojî zanista vekolana pêkhatin û sazbûna bêjeyan e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, morfolojî zanista avahîsaziya bêjeyan e. Peyv ji morfeman pêk tê ango morfem yekeya herî biçûk a watedar an jî erkdar e.

Morfem jî di nav xwe de dibin du bir: Morfemên watedar û morfemên erkdar. Morfemên watedar, bêjeyên xwedî wate ne. Morfemên erkdar jî bi tena serê xwe wateyek wan nîn e, ew bêjeyên din ji aliyê erk û wateyê ve temam û têkûz dikin.

Morfemên erkdar jî du cure ne; morfemên ku bi serê xwe têne nivîsandin û morfemên ku wekî qertaf bi bêjeyan ve dibin. Bo nimûne di kurdî de daçek ji morfemên erkdar ên serbixwe ne. Her wiha gihanekên mîna “lê, û, hem, an” jî morfemên erkdar ên serbixwe ne.

Heçî morfemên erkdar ên girêdayî ne, ew jî qertaf in. Ew jî dibin du bir; qertafên kêşanê û qertafên bêjesaz. Li ser qertafên bêjesaz heta niha gelek tişt hatine nivîsandin, lê belê der barê qertafên kêşanê de zêde nivîs û nirxandin nehatine nivîsandin.

Di vê gotarê de min divê ez li ser morfemên kêşanê yên kurmancî hin tiştan binivîsim. Serê pêşîn em li ser qertafên kêşanê rawestin, piştre jî derbasî morfemên serbixwe yên kêşanê bibin.

**QERTAFÊN KÊŞANÊ**

Qertafên kêşanê ev cure qertaf in ku tu wateyê li bêjeyan zêde nakin, li şûna wê, bêjeyan ji aliyê dem, kes, rawe, mêjer û zayendê ve temam dikin. Qertafên kêşanê yên kurmancî hinek pêşgir in, hinek jî paşgir in. Hem tên serê bêjeyê hem jî têne dawiya wê.

Qertafên kêşanê yên kurmancî ev in:

1- Qertafa dema niha /di-/

   ***Mînak:*** **Di***çim,* **di**kim, **di**dim, **di**xwazim, **di***bêjim…*

2- Qertafên raweya fermanî

   a) /bi-/ (pêşgira raweya fermanî)

   b) Paşgirên raweya fermanî: /-e/ (yekjimar), /-in/ (pirjimar)

   Mînak:

   **Yekjimar: bi***ç***e**, **bi**xw**e**, **bi**d**e**, **bi**gir**e**….

   **Pirjimar: bi***ç***in, bi**xw**in, bi**d**in, bi**gir**in**

3- Qertafên kesane (cînavkên pêvebestî)[1]

a) /-im/, /-î/, /-e/, /-in/

**Mînak:**

Ez dik**im**.

Tu dik***î***.

Ew dik**e**.

Em dik**in**.[2]

---

[1] Li ser van qertafan di nav zimanzanan de bîr û baweriyeke yekgirtî nîn e. Hinek wan wekî lêkera "bûn" bi nav dikin, hinek wekî cînavk bi nav dikin û hinek jî jê re dibêjin qertafên kesane. Min bi xwe jî di xebata xwe ya bi navê "Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî" de navê "Cînavkên pêvebestî" lê kiriye, lê belê min navê "qertafên kesane" jî bi kar aniye. Di tirkî de ji van re "şahis ekleri (qertafên kesane)" dibêjin. Li gorî baweriya min, tu pêwendiya lêkera bûn û van qertafan bi hev re nîn e. Lewre ew tên dawiya lêkera bûn bi xwe jî. Di dema niha de lêkera bûn ji holê radibe, lê di demên borî de ji nû ve derdikeve holê û ew qertaf jî tên dawiya wê. Her wekî, " Ez bûm, tu bûyî ..." Ji ber ku cihê kesan digirin mirov dikare jê cînavkên pêvebestî bibêje, lê belê navê qertafên kesane zêdetir cihê xwe digire. Her wiha ew li her derê nabin qertaf, ji ber ku ji rengdêr, cînavk û navdêran cuda têne nivîsandin, bi tenê bi lêkeran ve têne nivîsandin.

[2] Di kurmanciya nivîskî de paşgira kesane ji bo hemû cînavkên pirjimar /-in/ e. Lê di devoka Botan û Behdînan de ji bo kesê yekem ê pirjimar /-în/ e. Ev yek di helbestên Ehmedê Xanî de jî heye.

**Mînak:**

*Malûmê te bû ku em <u>nezan în</u>*

*Qedrê wî emanetî <u>nizanîn</u> (Mem û Zîn, r.154)*

*Xeffar e ku em <u>kirîn</u> gunehkar (Mem û Zîn, r.156)*

*-Sed merte gerçî em xirab în*

*Emma ji te naumîdi nabîn (Mem û Zîn, r.150)*

Dema em bala xwe didin zimanê din jî, ji bo her kesekî paşgirek heye. Bo nimûne di farisî de "em, î, Φ, îm, îd û end" in.

**Mînak:**

*Men reft**em (ez çûm)***

*To reft**î ( tu çûyî)***

*O reft (ew çû)*

*Ma reft**îm (em çûn)***

*Şoma reft**îd (Hûn çûn)***

*Hûn dik***in**

Ew dik**in**.

4- Qertafên payeyê yên rengdêran

a) Payeya rûberkirinê /-tir/

b) Payeya rajorîn /-tirîn/[3]

***Mînak:***

*Baş***tir**/ *baş**tirîn***

Berz**tir**/ berz***tirîn***

*Xweş***tir**/ *xweş**tirîn***

5- Qertafên gazîkirinê

a) /-o/ (yekjimar û nêr)

b) /-ê/ (yekjimar û mê)

c) /ino/ (pirjimar)

***Mînak:***

Heval**o,** birak**o,** *dengbêj***o**...

Heval***ê, x****wîşk**ê,*** *stranbêj**ê**...*

Heval**ino,** karker**ino,** cotkar**ino**....

6- Qertafên tewangê

a) -ê/ (yekjimar û mê)

***Mînak:***

---

*Anha reft**end (ew çûn)***

[3] Divê em ji bîr nekin ku forma /-tirîn/ di kurmancî de zêde nayê bikaranîn, li şûna wê di kurmancî de zêdetir "herî û tewrî" tên bikaranîn.

***Mînak:***

*Herî baş, tewrî baş…*

b) *Gurgîn Bêrîvan**ê** dibîne.*

c) /-î/ (yekjimar û nêr)[4]

**d) *Mînak:***

*Gurgîn**î** Bêrîvan dît.*

e) /-an/ (pirjimar)

**f) *Mînak:***

*Bêrîvan ji şivan***an** re got.

7- Qertafên nenasiyê

a) /-ek/ yekjimar

b) /-in/ pirjimar

***Mînak:***

**Yekjimar:** Mal**ek**, gund**ek**, jin**ek**, *mêr***ek**, kal**ek**, ciwan**ek**, heval**ek**....

**Pirjimar:** Mal**in**, gund**in**, jin**in**, *mêr***in**, kal**in**, ciwan**in**, heval**in**....

8- Qertafên demên borî

a) /-iye/ dema boriya dûdar

***Mînak:*** Hat**iye**, got**iye**, xwest**iye**, *dît***iye**, bir**iye**, kir**iye**....

b) /di-/ dema boriya berdest (çîrokiya dema niha)

***Mînak:*** **Di**hat, **di**got, **di**xwest, **di***dît,* **di**bir, **di***kir*....

c) /-bû/ çîrokiya dema boriya têdeyî

***Mînak*:** Hati***bû***, goti***bû***, xwesti***bû***, *dîti***bû**, biri***bû***, kiri***bû***...

d) /-bûye/ Çîrokiya dema boriya dûdar

---

[4] Di kurmancî de tewanga navdêrên nêr ber bi berzebûnê ve diçe. Tewanga rêzikî ya bi /î/yê li herêmeke teng a Kurdistanê tê bikaranîn. Hinek kurd jî navdêrên nêr bi awayekî din ditewînin. Navdêrên ku tê de /a/ û /e/ tune bin, natewînin. Lê belê heke di peyvekê de /a/ û /e/ hebin, /a/ an jî /e/ya kîteya dawîn a peyvê dibe /ê/.

***Mînak:***

*Boz**ê**n got.*

*Ez çûm baj**ê**r.*

*Hogir ji **ê**ş tê.*

***Mînak:*** Hati***bûye***, goti***bûye***, xwesti***bûye****, dîti****bûye***, biri***bûye***, kiri***bûye****...*

9- Qertafên raweya daxwazî

a) /-a/ (paşgira raweya daxwazî)

b) /bi-/ (pêşgira raweya daxwazî)

***Mînak: Bi****got***a**, **bi**kir**a**, **bi**d**a**, **bi**stand**a**, **bi**firot**a**, **bi**xwest**a**...

10- Qertafên neyîniyê

a) Qertafa neyiniyê ya raweya fermanî /me-/

***Mînak:*** **Me**ke**, me***çe,* **me**xwe, **me**de, **me**gire, **me***girî*....

b) Qertafa neyîniyê ya dema niha /na-/

***Mînak:*** **Na**kim, **na***çim,* **na**dim, **na**xwim, **na**girim, **na***stînim...*

c) Qertafa neyîniyê ya dema bê /ne-/

***Mînak:***

*Dê neke, dê neçe, dê neyê, dê negire, dê nestîne...*

d) Qertafa neyîniyê ya demên borî /ne-/

e) Qertafa neyîniyê ya hinek lêkerên awarte /ni-/

***Mînak:*** nikarim, niza*nî.*

***MORFEMÊN KÊŞANÊ YÊN SERBIXWE***

Ji bilî van qertafan, hinek morfem hene ku ew wekî qertafan bi bêjeyan ve nabin, ji wan cuda bi tena serê xwe têne nivîsandin. Em dikarin ji wan re morfemên kêşanê yên serbixwe bibêjin. Peywira wan morfeman jî wekî qertafên kêşanê ye. Lê belê ew bi tena serê xwe têne nivîsandin.

1- Morfema dema bê "dê"

Morfema dema bê "ê/ dê" ji wan morfemên kêşanê yek e. Ew bi serê xwe tê nivîsandin. Ji aliyê peywirê ve naşibe daçekan, mirov nikare navê daçekê. Ne qertaf e, ne jî daçek e, lewre jî mirov dikare wê wekî morfemeke serbixwe ya kêşanê bi nav bike.

2- Morfemên payeya rajortirîn "herî û tewrî"

Wekî din jî di payeya rajorîn de forma "herî/ tewrî" heye. Ew form jî nakeve nav qalibê qertafan. Ev forma "herî/ tewrî" hinekî dişibe "the most" a îngilizî, li ser navlêkirina wê jî lihevkirin nîn e.

***Mînak:***

Xwarina ***herî*** *xweş, xaniyê* ***tewrî*** *bilind, gundê* ***herî*** *dûr…*

3- Morfemên kesane

Qertafên kesane ku me li jora çêlî wan kir, bi tenê dema ku tên dawiya lêkeran dibin qertaf wekî din bi tenê xwe têne nivîsandin. Lewre mirov dikare wan jî wekî morfemên serbixwe yên kêşanê bi nav bike.

Mînak:

*Ez baş* **im**/ *tu baş* ***î***/ *ew baş* **e**/ *em baş* **in**/ *hûn baş* **in**/ *ew baş* **in**.

Ez mamoste **me**/ tu mamoste ***yî***/ ew mamoste **ye**/ em mamoste **ne**/ *hûn mamoste* **ne**/ ew mamoste **ne**.

**Perawêz:**


1- Frank Parker, Linguistics for Non-Linguists, Department of English Louisiana State University. Austin, Texas, 1986.

2- M. Emîn Bozarslan, Mem û Zîn – Ehmedê Xanî, Weşanên Deng, Stenbol, 2005

3- Samî Tan, Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.